| | |
|---|---|
|  *Dr. Sozdar Mîdî (E. Xelîl)* |  *wergera ji erebî: Mustefa Reşîd* |


# Tîrêjên Çarşembê

**Xelek - 10**

## Gelo hin damarên Atûniyê Horî /Mîttanî ne?

### Dema girên Kurdistanê biaxivin:

Bi me ra derbas bû ku *ayîna rojanî (şemsanî)* li ba pêşiyên Kurdan û Misiriyan; û pir gelên din jî gelek kevine. Ji lew ra, ne tiştekî bêgane û xerîbe ku *Atûnî* û *Zerdeştî* (berdewamiya yezdaniyê) di hin têgeh û nîşanan da mîna hev bin. Lê tevî wê jî, tiştekî gelek balkêşe ku Fer'ewn *Amûnĥûtebê Sêhem* xwe ji ayîna xwedawend *Amûn (Amîn)* bidûrxistiye, û kurê wî Fer'ewn *Exnatûn* şoreşeka ayînî gewre di vê babetê da pêkaniye ku ayîna xwedawend *Atûn* xistiye cihê ayîna xwedawend *Amûn*. Gelo peywendiya çanda *Horî /Mîttanî* bi vê yekê ra heye?

Helbet li ber destê me belgeyeka berbiçav nîne ku bandora *rojaniya (şemsaniya)* Horiyan li *Ayîna Atûnî* hebûye. Bi gelemperî agahdariyên derbarê *Horî /Mîttaniyan* ji belgeyên tomarkirî yên misirî, hîttîtî û aşûrî gihîştine me. Lê ev agahdarîne pir kêm û biçûkin li gor peydabûna *Horiyan* hên ji destpêka hezarsala duwem ya b.z. da ku wan bi rêveberiya liq û şopa *Mîttanî* padîşahiyeka mezin avakirine û ew bi dirêjahiya sê sedsalan di warên siyasî, çandî û aborî da hêzeka herêmî pir girîng bûne.

Em bawer dikin ku ev girên çêkirî û warên dîrokî ku li seranserê Kurdistanê hene - li rojava ji Derya Sipî da bigire heya bi Gola Ûrmiyê li bakurê rojhilat û heya bi herêma Kerkûkê li başûrê rojhilat - ku di wan da agahdariyên gelek pir û bi nirx li ser *Horî / Mîttaniyan* hene. Gava Kurdistan rizgar bibe û gir û warên wê yên dîrokî biaxivin, hîngê wê şoreşeka zanistî di dîroka Rojhilata Navîn da pêkwere, û ewê pir agahdariyên şaş, çewt û çewtkirî sererast bikin.

### Pênc nîşanên balkêş:

Helbet, li gor belgeyên ku di dest me da hene, em nikarin bandora çanda horî li *Atûniyê* piştrast bikin. Lê belê, pênc nîşanên diyar hene ku îmkan û gengaziya vê yekê pir xurt dikin; ew jî evin:

**Nîşana yekem:** Peywendiyên zavatiyê di navbera herdu malbatên padîşahî yên misirî û mîttanî da di heyama Fer'ewn *Amûnhûtebê Duwem* (1436 - 1413 b.z.) da destpêkririn û çar nifşan berdewam kirine. Hin caran padîşahê misirî bi bêhtirî yekê ji dotmîrên *Mîttaniyan* ra dizewicî. Dayîka *Amûnĥûtebê Sêhem* dotmîreka mîttanî bû û herweha kebaniya wî û kurê xwe *Exnatûn* jî bi dotmîreka mîttanî ra zewicandiye. Helbete, dotmîrên *Mîttaniyan* bi tenha serê

xwe nedihatin, û bi her hal bi dehan û hin caran bi sedan jî cariye û xizmetkar bi wan ra dihatin. Wek tê gotin, 317 cariyeyan hevaltiya dotmîr *Çîlo-Xîpa* (*Gulo-Xîpa*) kirine gava ew bi padîşah *Tiĥûtmûsê Çarem* ra zewiciye. Piraniya van cariye û xizmetkaran bi mezinên berpirsiyarên Misiriyan ra zewicîne û helbet ji wan kur û keç peyda dibûn û bi Misiriyên derdora xwe ra tevlihev dibûn.

Wek ku niha jî derbarê jina Kurd - neviya Horiyan - tê naskirin, ew kan û kelaha bermaya neteweyî / niştîmanî ye; ew ya dawiyê ye ku dest ji wê bermayê berde. Herwisa, wê dotmîrên *Mîttaniyan* û cariyeyên wan jî wisa bin, ew bi çand û baweriya horî perwerde bûbûn û wê ne karekî hêsan be ku ew ji çand û baweriya xwe bêne nixumandin. Bê guman, wan ev çand û baweriya xwe digihandin qesrên padîşahên Misirê; digihandin malxiyên xwe, kur û dotên xwe û xizmetkarên xwe di qesra padîşahî da.

**Nîşana duwem:** Dema padîşahên Misirê bi dotmîrên *Mîttaniyan* ra dizewicîn - ji hêla din va - bi dotmîrên *Kaşşiyan* ra jî zewicîne. Kaşşî jî ji pêşiyên gelê Kurdin û ew jî di heyama *Horî / Mîttaniyan* da li ser text bûm. Warê wanî bingehîn çiyayên Zagrosê ne (Loristan). Wan li Babil (Îraqa niha) 433 salan (navbera 1595 heya 1162 b.z.) serdarî kiriye, û di dewlemendkirina şaristaniya wê da beşdarî kirine. Peywendiyên hevpeymanî û zavatiyê di navbera wan û padîşahên Misirê da jî xurt bûye.

Divêt bête gotin ku *Kaşşî* jî mîna *Mîttaniyan* ariyanî ne. Ji xwedawendên wan yên navdar xwedayê rojê *Soryaş*e. Ev şêweyê kaşşî yê navê xwedayê mîttanî *Asora* ye û yê navê xwedayê hindî *Sorya* (*Surye*) ye û yê navê xwedayê ariyanî "*Xûr*" û "*Ahûra*" ye. Navê xwedayekî ji xwedayên *Kaşşiyan* "*Xûd*" (Khud) bûye[1]. Heya niha jî, navê xweda li ba Kurdan û hin gelên ariyanî bi awayê "*Xûda*" (*Khuda*) tê gotin li cihê peyva "*Allah*" yê yekem tê bikaranîn. Di zimanê înglîzî da jî bi awayî "God" û bi zimanê almanî jî bi awayê "Gott" tê gotin û herwisa di hin zimanên ewropayî din da jî li nêzî vê bilêvkirinê heye.

Ev tiştê derbasbûyî tê wê maneyê ku ji *Ayîna Rojeyî (Şemsanî)* ra di qesrên padîşahên Misirê da du jêder hebûne - dotmîrên *Mîttaniyan* û dotmîrên *Kaşşiyan* û ew kesên ku hevaltiya wan ji cariye û xizmetkaran dikirin û hebûna wan li Misirê, ji bona çîna serdar, mîna pencereyekê bû ku li çand û bermaya ayînî mîttanî û kaşşî temaşe bikin, ji aliyê bawerî, têgihîştin û dêlindêzên ayînî da, û helbet di rewşeka wisa da, kêm yan zêde, wê hin kes bikevin bin bandora vê bermayê.

**Nîşana sêhem:** Padîşahên Misiriyan yên ku bi dotmîrên *Mîttaniyan* ra dizewicîn bi bandora giyanî ya xwedayên *Horiyan* û şiyana wan ji bo saxkirina ji nexweşiyan bawer dikirin. Heger ne wisa be, çima razî bûne ku padîşahê *Mîttanî* peykerê hin xwedawendên *Mîttaniyan* ji wan ra bişîne daku wan ji nexweşiyan saxbikin? Wek tê zanîn, padîşahê *Mîttanî Tûşratta* peykerê xwedawenda evînê û cengê ya mîttanî *Şawûşka* (*Shawushka*) ji padîşah *Amûnĥûtebê Sêhem* ra şandiye daku wî ji nexweşiyeka diranan sax bike[2].

Ma gelo peykerê xwedawend *Şawûşka* bi tenha serê xwe dihate şandin? Helbet, wê pir oldarên taybetî wê jî pêra hatibin şandin. Ma ne ew oldar bûn, yên ku bi dêlindêzên taybetî *Şawûşka* radibûn?. Ma gelo hema ji dûr da avsîn û berbencên xwe dişandin? Helbet, wê ev dêlindêz bi beşdariya padîşah, malbata wî û derdorên wî hatibin pêkanîn.

Tiştê balkêş ewe, di jêderan da nehatiye ku padîşahekî misirî xwedawendek ji xwedawendên Misirê şandibe *Waşşûkanî* - paytextê *Mîttaniyan* daku padîşahekî *Mîttaniyan* ji nexweşiyekê sax bike; yan jî kesekî nexweş ji malbata padîşahî. Gelo ev tê çi maneyê? Ma ne ev nîşana wê yekê ye ku li ba padîşahên Misirê, di kûraniya dil da, rêzdariyeka taybet ji xwedawendên

*Horiyan* ra hebûye. Ma gelo gengaz bû ku padîşahê *Mîttanî* xwedawendekê ji padîşahê Misirê ra bişîne, bêyî piştrast be, ku ew padîşah bi dilekî fireh bi şiyanên wê xwedawendê bawer dike û wê dipejirîne? Ma baweriya padîşahê misirî bi şiyana xwedawenda horî bi saxkirina ji nexweşiyê, ne tê wê maneyê ku ew bawer dike, xwedawendên misirî nikarin vê erkê bi cih bînin?

Divêt em bêjin ku padîşahên Misirê xwe ji nifşên xwedayan dihejmartin (*Ĥûr, Reh, Amûn*), Misirî bi Misirtiya xwe pir serbilind bûn û bawerdikirin ku mêranî û payedarî tenha para wane û ne ya gelên dine[3]. Gava em van rastiyan bînin ber çavên xwe, hîngê girîngiya wê yekê ji me ra tê xuyakirin ku padîşahekî Misirê ji pozbilindiya xwe ya neteweyî bê xwarê û bipejirîne ku xwedawendekî biyanî jêra bê şandin daku wî ji nexweşiyê sax bike. Herwisa di vir da rola dotmîrên *Mîttaniyan* di pêkanîna vê baweriyê da li ba malxiyên xwe û zarokên xwe tê xuyakirin.

**Nîşana çarem:** Bi me ra derbas bû ku bidûrketin ji ayîna xwedawend *Amûn* di heyama Fer'ewn *Amûnĥûtebê Sêhem* da (1405 - 1367 b.z.) destpêkir; wî kelîja oldarên vî xwedawendî kêm kir û navtêda ku xwedayê rojê bê perestin. Dîsa bi me ra derbas bû ku kurê wî *Amûnĥûtebê Çarem* (*Exnatûn* ji 1367 heya 1350 b.z. serdarî kiriye) li dijî ayîna xwedawend *Amûn* derket û bi awayekî fermî ayîna xwedawend *Atûn* ferz kir û da pejirandin. Dîsa bi me ra derbas bû ku dayîka *Amûnĥûtebê Sêhem* mîttanî bû, ew bi xwe jî bi du dotmîrên *Mîttaniyan* ra zewicî bû û kurê xwe *Exnatûn* (*Amûnĥûtebê Çarem*) bi dotmîreka mîttanî ra zewicand.

Başe, ma ne wisa ye ku em li gor logîk û aqilmendiyê, li sedemên bidûrketina ji *Amûniyê* di heyama *Amûnhûtebê Sêhem* da bipirsin? *Amûnĥûtebê Sêhem* ji nifşê sêheme ji padîşahên Misirê yên ku bi dotmîrên *Mîttaniyan* ra zewicî bûn û *Exnatûn* ji nifşê çareme. Ma ev nayê wê maneyê ku gelek gengaze ev padîşahên ku di hembêza dayîkên xwe da mezin bûne û hevaltiya kebaniyên xwe kirine ketibin bin bandora çanda horî û bin bandora *Ayîna Rojeyî* (*Şemsanî*) ku di wê çandê da serdar bû?

**Nîşana pêncem:** Em di mîtologiya misirî da rastî ti xwedawendan - ne biçûk û ne mezin - bi navên *Atûn / Etûn,* pêş dema Fer'ewn *Exnatûn,* nayên. Dîroknas *Morris Karrocier* dibêje ku *Etûn* xwedawendekî rojeyî bû û navê wî dihat maneya "***qaşê rojê***"[4]. Û dîroknas *William Langer* jî di vê babetê da dibêje ku navê "***Etûn***" tê maneya "***tîrêja rojê***"[5]. Ev yek peyva "*Etûn*" ya kurdî tîne bîra me ku tê maneya "*pêta agir*". Lêkolîneran bingeha zimanî ya peyva "*etûn*" negotine; ka gelo ew peyveka misirî ye yan ne misirî ye. Lê belê, hebûna wê di zimanê kurdî yê niha da, nîşana wê yekê ye ku ev peyveka ji bermaya kurdî ya kevine. Gelek gengaze ku ev peyv li ba *Horî / Mîttaniyan* ji bo navê rojê dihate gotin.

## Baweriya dawî:

Kurtahiya vê mijarê ewe ku *Ayîna Atûnî* di çarçewa gelemper ya *Baweriya Rojeyî* da ku bi sedsalan li Misirê serdar bûye pêkhatiye. Lê belê, ew bi dîtina xwe ya cîhanî ji Misiriyan ra biyanî bû û herwisa bi ramana xwe ya yekxwedayî û razber ji hemû teşeyên daringî; bi tîrêjiya xwe aştiyane û bidûrketina xwe ji bikaranîna darê zorê tê naskirin. Padîşahên Misirê, alîgirên xwedawend *Amûn*, ji bo vî xwedayî dîlên şer yên *Sûriyan*, *Horiyan* û kesên din dikirin qurban. Lê belê, em tiştekî wisa di *Ayîna Atûnî* da nabînin[6].

Bala hin lêkolîneran kişandiye ku *Atûnî* ayîneka ji derva hatiye Misirê ye. Dr. *Ehmed Sûse* dibêje: "**Herhal *Exnatûn* ayîna yekxwedayî di bin bandora *Heksûs* û heyama *Yûsif* û *Ye'qûb* da biriye**"[7]. Mebesta wî bi "**heyama Yûsif û Ye'qûb**" *Benî Îsraîle* ku li Misirê jiyane. Başe, ma gelo! *Heksûs* ji kîjan erdnîgariyê derketine? Û ji kîjan erdnîgariyê pêximber *Îbrahîm*

ku *Benî Îsraîl* wî wek bapîrê xwe dibînin, derketiye? Ma ne ew erdnîgariya *horî/mîttanî* bi xwe ye[8]?

Ji bilî vê, heger *Exnatûn,* di doza xwe ya *Atûniyê* da, di bin bandora *Heksûs* da bûye, ew Heksûsên ku Misir talan kirine û ji 1720 heya 1570 b.z lê serdar bûne, û di bin bandora *Benî Îsraîl* da bûye, yên ku di heyama *Heksûs* da hatine Misirê (wek piraniya pir gotûbêjan), tevî ku du sedsal di navbera derketina *Heksûs* ji Misirê û heyama *Exnatûn* da hene; hîngê çima emê nikaribin bêjin ku *Exnatûn* di bin bandora *Baweriya Rojeyî* ya *horî/mîttanî* da bûye, ya ku di wê demê da li nîvê jorîn yê Sûriyayê serdar bû û bi rêya dotmîrên *Mîttaniyan* derbasî Misirê bûye?

Çarşemb, 03.06.2015

## **Jêder:**

[1] Cemal Reşîd Ehmed: Kerkûk di demên kevnar da, rûpel 32.
[2] Fadel Ebdulwahed Eli: Ji Somer ta bi Tewratê, rûpel 158.
[3] Dr. Mihemmed Beyyûmî Mehran: Benû Îsraîl, 1/240.
[4] Mourris Karrocier: Dîroka Şaristaniyan ya gelemper, 1/96.
[5] William Langer: Berfirehiya dîroka cîhanê, 1/49.
[6] Dr. Muhemmed Ebdulletif Muhemmed Eli: Xûrrî û peywendiyên Misirê bi wan ra, rûpel 36, 41, ...
[7] Ehmed Sûse: Şîroveya Ereb û Cihûyan di dîrokê da, rûpel 477.
[8] Vilaykovski: Heyamin tevlihev, rûpel 83. Seyed El-Qimni: Îsraîl, rûpel 288-289. Tewfiq Suleiman: Lêkolîn li şaristaniyên kevnar yên rojavayê Asiyayê, rûpel 90.